

vi welatî nas bike !



Indonesya ...

Rubber; Nêzikî (2) milyon kêm 2
Hejmara xelkî; (203,583,000)milyon kes

Paytext; Cakarta, pitir ji 11 milyon kesan lê dijin

Ayîn; pitir ji %95 misilmanin, yêni di kiristîyan, bozî, nihîyanî

Pare; Rupiyê indonisi

Sistema deshelatdarê; Komareka federale

Mezintirin bajêr; Bandonk, Sorabaya a




Indonesya bi ruper û hejmara xelkê xwe, mezintirin dewleta mislimane.

Indonesya di keve pişka başûrê rojhelata Asiya li ser hêla êkvatûri. Axa wê ji (17 508) giravan pêktê. Ji wana bi tenê (60000) bi mirovin. Mezinitrin û pirxelktirin giravên wê pêncin: Sumatra, çawa ku pitir ji (80) milyon kesan lê dijin, Kalimantan, Solawis û irîyan Caya ye.

Ji giravên di yên navdar:

Hêlmahida, Teymûr, Fadoraw, Bali ye. Li sala (1891)ê, li girava (Cawa), paşmayên mirovekê destpêkê hatine dîtin ku berî nîv milyon salan li wêrê jiya bû. Hîngî zanayan hîzir kir ku destpêka peydabûna mirovan li wêrê bû. Lê piştî hîngî paşmayên mirovekî li Efrika hatine dîtin ku berî milyon salan jiya bû.





Her çewa be İndunisya êk ji kevintirin cihêن jiyana mirovên berê bû û heta niha jî hindek hoz û civak hene ku wek mirovên berê li nav daristanên wê dijin. Li sala (1605)ê İndunisya kete jêr destê dagırkeren Holendî. Holendîyan bi şeveyekê gelek kirêt xelkê wê çewsandin û xêr û bêrên welatê wan dizin. Li hember vê sistemê xelkê wê gelek şoreş û serhildan kirin lê her hemu şoreş û serhildanên wan bi şeveyekê gelek xwînawî dihatne herişandin.



İndunisya di salên cenga cihani ya duyê da kete jêr destê Yabanê û li sala (1945)ê piştî Yaban di şerî da şikestî, serxwebûna xwe ragehandin. Holenda dijî serxwebûna wê derkeft lê piştî çar salan neçar bû dan bi serxwebûna wê bidet.



İndunisya welatekê çiyayî ye û bilinditirin çiyayê wê (Kêrintigî)ye ku bilindahîya wî (3800) mîtrin. Li İndunisya gelek vulkan hene kû her heyam di peqin û zîyanên mezin digehinne xelkê wê. Bi tenê li (Cawa) sed vulkan hene.



8% ji axa İndonisya bi kêr çandinê dihêt. 55% ji xelkê wê di kertê çandinê da kar diken û bi tenê 10% di kertê pişesaziyê da kar diken.

Li İndonisya birinc, pembû, genmok, pitat, kasava, levenen şekrê, soya, qehwe, çay, tütin, gûza hindê, kekew û kes katî û meywe dihêne çandin û ji samanen siroşti pitrol, gaz, nilk û gelek mîtalên di. Ji piş es aziyen wî jî, cil û armûş, mubîlya, çek û balefir dihêne berhem-henan. Du sêkên axa wê bi daristanen baranê didapoşîne û hindek ji baştirin darê mubîlya li wêrê şîn dibe wek darê ebnos, ekacoyê turu dilbi.



İndonisya welatekê bi arêş eye û sistema wê ya sîyasi ji si stemen baş nîne. Her wesa İndonisya berdewam dikevin karesatên siroşti da

